



KOMA STENBOLÉ YA MALBATÉN LGBT'YAN



Gava Ewil

Ji Tirkî: Ferhat Kutdenur



Punto Baskı Çözümleri





KOMA STENBOLÉ YA MALBATÉN LGBT'YAN



Gava Ewil


Ev pirtûka destêwede ji aliyê LİSTAG(Malbatên u Hevalên Hevzayendan Gey,Lezbîyen,Transseksûel 'an)ê ve Jiboy malbatên ku zarên wan Lezbîyen,Gey yan jî Bîseksûelin hatiye avakirin. Jiboy malbatan ku qebûlkin a zarên xwe hesantir bikin. Ev pirtûk jiboy van malbatên ku di dema qebûlkinêde mina gava ewil hatiye avakirin. Ji sedemavî yekê nave wî pirtûkê gava ewil e. Jiboy ku ev dema qebûlkinê gav bi gav di rêyekî rast de biçe. Bersivên hemû pirsgerên me divî pirtûkêde hene.

Em spasîyên xwe jiboy hemu kesên ku emek dane jiboy naverok u çap a vî pirtûkêre dişînin. Ji Psikyatrîst Dr. Seven Kaptan re ji CETAD(Civaka Perwerdahî u Tîmar Kirina Zayendîtî)ê re gelek spas jiboy xebatên wî grîng u piştgirîya wî.

PÊŞEK

Dema ku malbat hîn dibin wekî lêzim û nasên wan ji aliyê beralîbûna zayendî (hevzayendbaz, bîseksuel) yan jî pênasî zayendê (transseksuel) ve cuda ne, çêdibe ku di qebûlkirina vê agahîyê de tûşî zehmetîyan bîn. Pîrrî caran ev zehmetî dişibin ‘qonaxa şîngirtinê’ ya dema ku nasekî/e me koça xwe ya dawî dike, bi serê me de tê. Ji bo zehmetîyên vê gavê hatî serê we yan jî di demên li pêş de dibe ku bîn serê we, me ev namîlke amade kir, ku hizra me ew e ku peywendîdarî pirsên ku di giştîya vê qonaxê de dibe ku hişê we bilî bikin bi we re bibin alîkar, bi saya ezmûnên hevbeş ên malbatên qonaxên hevdirûv ên wek we jîyayî.

Girîngtirîn rewşa ku divê wekî destpêk hûn bînin bîra xwe ew e ku agahîyeke bi têra xwe girîng û takekesî ya der barê kesê/a ku hûn jê hez dikin de emanetî we dibe. Heye ku hûn hest pê bikin wekî hûn tenê ne, lê di vir de em dixwazin bînin bîra we ku ji nava me bi hezaran kes di qonaxên hevdirûv re derbas bûne. Hestên we, pirsên we û şayîşên we bi têra xwe girîng in. Ev rêber dê wekî jêderekê di xizmeta we de be ji bo ku bergîya beşek ji van bê dayîn.



Dê û Bav, Malbat û Hevalên wek We Pêşniyarên Xwe Tînin

Sedemek heye ku hûn vê rêberê bixwînin. Reng e ku der barê rewşa kesên ku hûn ji wan hez dikin tê de ne pirsên we hene. Malbatên LİSTAG'ê di vir de zanyarî û pêşniyarên xwe yên pîrr bingehîn pêşkêş dikin, ên ku alîkarîyê bikin da ku hûn di nava vê dema nedîyar de ji xwe re rêya xwe derxin:

1. Hûn ne tenê ne. Girîng e ku hûn bînin bîra xwe wekî hûn û kesê/a ku hûn jê hez dikin ne tenê ne. Ji ber kêmbûna statîstîkên heyî, hejmara teqez a takekesên LGBT ên li cîhanê nayê zanîn. Lêbelê, bi bawerîya gelemperî, tê hesabandin ku di hemû civakan de ji her 10 kesekî kesek hevzayendbaz, bîseksuel û transseksuel e.

2. Hûn Ne Berpîrsîyar in. Eşkere nayê zanîn bê ka çima kesek hevzayendbaz, bîseksuel yan jî transseksuel e, eynî weku nayê zanîn bê ka çima kesek heteroseksuel e... Lêbelê tişteki zehf girîng heye, ku tê zanîn; ti dê û bav nikare ji ber şeweyê xwe yê gihandina zarokê/a xwe bibe sedema ku zarokê/a wan ji awirê beralîbûna zayendî yan jî pênasaya zayendê ve cîyawaz be. Hûn ne berpîrsîyar in û ya jê girîngtir jî ew e ku bi wî/ê kesî/ê re, yê/a ku hûn jê hez dikin, rewşeke çewt tune. Girîngtirîn tişt ew e ku hûn yekî/e wisa bin wekî kesê/a ku hûn jê hez dikin bi we ewle be bi qasî ku bikaribe rastîyeke bingehîn a peywendîdarî kîbûna xwe ji we re bibêje, ku pêwîstîya wî/ê bi piştevanîya we heye ji bo ku bi pêş de biçê. Ev yek dikare derfetê dabîn bike da ku di vê rêwîtiyê de hûn bi hev re bi pêş de biçin û li gel hev û din peywendîyeke xurttir û dewlemendtir çêkin.

3. Bi tenê rastî. Hewil bidin ku hûn xwe bigihînin zanyarîyên

durist-zanistî, ne ku pêzanînên ku hûn ji devên hinekan seh bikin.

Zayenda bedenî: Em zayenda bedenî dibêjin bo zayenda xwe ya bê ka bi libatên zayendî re taybetîyên mêtîyê hene yan yên nêrtîyê û li gorî anatomîya xwe wekî jin tê destnîşankirin yan mêr.

Pênasa zayendê: Bi vê yekê ve kes wekî jin yan jî mêr di zayendeke dîyar de bîr dibe xwebûna xwe. Bo kesên ku xwedîyên bedena jinan in, xwe wekî mêran dibînin û terîf dikin; yan jî, yên ku xwedîyên bedena mêran in, xwe wekî jinan dibînin û terîf dikin, transseksuel tê gotin.

Beralîbûna zayendî: Beralîbûna daxwaz, hest û reftarên zayendî yên kesekî/ê bo zayendeke dîyar. Daxwaz û peywendîpêkirina erotîk berê xwe dide kîjan zayendê, hişyarker ji kîjan zayendê tîn, bi vê re jî kîjan zayend ji alîyê zayendî ve rakêşer e, ev yek puxteya beralîbûna zayendî pêk tînin. Ku peywendîpêkirin û daxwaza kesî/ê arasteyî dij-zayendê be, ew wekî heteroseksuel tê binavkirin; ku peywendîpêkirin û daxwaza wî/ê arasteyî zayenda xwe be, wekî hevzayendbaz; ku ew kes dikare her du zayendan jî rakêşer bibîne, wekî bîseksuel.

4. Girîngîya hayjixwehebûnê. Dema ku hûn bi vê taybetîya kesê/a ku hûn jê hez dikin hişyan, dibe ku hûn tûşî hesta windakirinê bûn, piçekî moletê bidin xwe, pê şîna vê yekê girê din. Girîng e ku hûn kesê/a ku hûn jê hez dikin bi wê rewşa wî/ê ve bipejirînin û ji bo ku hûn bikaribin peywendîya xwe ya germ li gel çêkin, ji derdora xwe ya civakî yan jî ji komeke malbatan piştevanîyê bigirin û hestên dilgiranîyê yên di dilê xwe de bibihêrin.

Divê hûn di bîra xwe de bigirin wekî helwestên pêşîn ên ku li hemberî kesê/a ku hûn jê hez dikin wergirin, ji ber ku ew ê peywendîya we ya li gel wî/ê ya di dahatûyê de destnîşan bikin, dê girîng bin. Hewil bidin ku hûn hestên xwe yên

girantir ên wek hêrsbûn, bawernekirin, şokê yan jî şikestina xeyalan bi koma xwe ya piştevanîyê re bi par ve bikin, di kîjanê de hûn ê wan bi awayekî ewletir bidin der.

Ji bo destpêkê, hest û bawerîyên xwe yê erênî û bi dil û can peyda bikin, ên ku hûn bikaribin nîşan bidin. Hevokeke bi qasî “Çi diqewime bila biqewime, ez ji te hez dikim” sivik jî çêdibe ku bibe xaleke destpêkê ya ku gotûbêja we bêtir bi pêş ve bibe.

Komên piştevanîyê yê malbatî cîyên guncan in, di nava kîjanan de bi dê û bav, endamên malbatan û hevalan re, yê ku ezmûnên hevdirûv dîtine, hûn dikarin hestên xwe, tengezariya xwe yan jî matmayîna xwe bidin û bistînin. Ji kerema xwe serdana malpera me ya înternetê bikin da ku hûn hîn bibin bo we cîyê nêzîktirîn şaxa Koma Malbatên LGBT'yan li kû ye.

5. R-Ê-Z-G-I-R-T-I-N. Kesê/a ku hûn jê hez dikin nîşan da ku wêrekî pê re heye ku pê de çû û gote we. Vê reftarê wêrekîyeke hestî ya zehf zêde û rastgotî divê. Bidin ser şopa wî/ê û her çi dilê wî/ê herî pirr rihet bike, rêzê li wê yekê bigirin. Kesê/a ku hûn jê hez dikin her çi dixwaze, guh bidinê û baştirîn tiştê ku ji we tê bikin ji bo ku hûn rêzê li xwestekên wî/ê bigirin.

6. Pêdeçûn. Yekane kesê/a ku dîyar bike bê ka ew ê kîngê beralîbûna xwe ya zayendî yan jî pênasa xwe ya trans ji malbata fireh û derdora we ya civakî re derevebike ew kes e, yê/a ku hûn jê hez dikin. Bidin xwe ku di mijara derevekirina bo kesên dîtir de rêzê li xwestekên wî/ê bigirin.

7. Dahatûya we ronî ye. Di dahatûya kesê/a ku hûn jê hez dikin de dibetîyên bêdawî hene. Dibe ku di rêwîtiya wî/ê de ev kutakirina zankoyê be, bipêşdeçûna di pîşeyê xwe de be yan jî ji xwe re hevserokî/ê peyda bike û zarokên wî/ê çêbin. Dibe ku hewce be hûn çav bi hizrên xwe bixin, ên ku hûn dikin

bo dahatûya kesê/a ku hûn jê hez dikin, lê dîsa jî li gel tiştên ku sibehroj bi xwe re bîne hêvîyên tekûz hene.

8. Ji bo qencîya kesê/a ku hûn jê hez dikin. Pê de pê de ku kesê/a ku hûn jê hez dikin bi pênasa xwe ya zayendî ve bête hebandin, reng e ku hûn rûdanên erênî bibînin. Reng e ku kesê/a li ber dilê we ezîz bêtir têr, bextewar û firêqet bibe. Ew ê nema bikevin rewşa ku tê de bibin tiştêkî ku bi xwe ne ew in. Ku ew jîyaneke durist û eşkere bijîn, ev ê dabîn bike ku ew bi awayekî têtijîtir li pey hemû armancên xwe yên din biçin.


9. Em li vir in ji bo ku piştevanîyê li we bikin. LÎSTAG û komên piştevanîyê yên malbatî yên li bajarine din, li bajarê ku hûn lê ne û tevî rêyên ragihanê yên ku pê bikaribin bi têlefônê hûn xwe bigihînin, bi hebûna xwe berdewam in ji bo ku piştevanîyê bikin hem li we hem jî li kesê/a ku hûn jê hez dikin. Pirtûk, vîdyo, malperên înternetê û komên civakî yên cihêreng ên ku bi raya we alîkar bin li dawîya vê rêberê hatine nivîsîn.




Di Qonaxa Vekirina Dilê Xwe De 5 gihînekên ji bo Takekesên Malbatê:

1-Şoq

- Çêdibe ku şok, ji çend xulekan heta çend hefteyan, di nava demeke guhêrbar de bi dawî bibe.
- Dibe ku hûn hizir bikin ku zarokê/a we guherîbe, dibe ku hûn hest pê bikin ku hûn jê havî bûne, qey hûn wî/ê nas dikin. Lê yekane tiştê ku divê hûn bizanibin ew e ku wek her tim ew zarokê/a we yê/a yekta ye, yê/a ku hûn jê hez dikin. Tiştê ku guherîye bi tenê ew e ku êdî hûn bi taybetîyeke xweserî wî/ê dizanin, a ku we pê nizanibû. Tevî ku di destpêkê de ev agahî bike ku hûn hest pê bikin wekî hûn ji wî/ê havî bûne, ya rast di qonaxa li pêş de, tam berevajî vê yekê, ev ê bihêle ku hûn nêzîkî hev û din bibin. Bêyî ku raz hebin, peywendîyeke bêderew dê bê şik û guman dabîn bike ku hûn li gel kesê/a ku hûn jê hez dikin peywendîyeke bistehtir û germtir daynin.



2-Mandel



• Ku we bivê, bigirîn, çi ku girîng e hûn hestên xwe derbibirrin. Lê di vê heyamê de ne li bendê bin ku zarokê/a we piştevanîya dilîni bide we. Di gihîneka pêşîn de dê he paktir bibe ku hûn vê piştevanîyê ji peywendîyên xwe yê civakî yan jî profesyonelan bigirin. Hûn dikarin pirsan ji wan bikin, lê hemû bersivên van pirsan bi wan re tunebin jî, matmayî nemînin. A rast dê kêrhatî bibe hûn hizir bikin bê ka di vê gihînekê de hûn dixwazin bibihîzin bersivên hemû pirsên ku hûn dixwazin bipirsin yan na. Ji ber wê yekê jî, dê ji bo we sûdewartir bibe, bêyî ku hûn bilezînin, ku pêkan be, her wekî hevalên we, yê ku hûn hez dikin, komên piştevanîyê yê malbatî, hûn torên xwe yê piştevanîyê pêk bînin û piştevanîya dilîni û pêzanîni ya ku we pêdivî pê heye dabîn bikin.

• Dibe ku hûn hizrên her wekî ‘Bi tenê serî lê gêj bûye’ bikin. Heke zarokê/a we gotibe, ez LGBT me, bi îhtimaleke pirr xurt hişê wî/ê di vê mijarê de zelal e. Gelek endamên LGBT’yan, berîya ku qonaxa qebûlkirina pênasaya xwe kuta bikin, naxwazin li ba malbatên xwe devê xwe vekin.

• Çêdibe ku hûn hizir bikin wekî psîkiyatristek bikaribe alîkarîyê bike. Çêdibe ku bi kêr bê wekî mirovên ku di mijara beralîbûnên zayendî de tûşî zehmetîyan tên bi psîkiyatristan bişêwirin. Ev yek we, zarokê/a we, hevserê/a we û endamên malbatê yê din jî digire nava xwe. Lê ti psîkiyatristek nikare beralîbûna zayendî yan jî pênasaya zayendê ya zarokê/a we biguherîne. Beralîbûna zayendî û pênasaya me ya zayendê, her wekî rengê çavê me, ne ew



taybetî ne, yên ku em hildibijêrin, yan jî heke em bixwazin, em bikaribin biguherînin, ew taybetîyên me ne, yên ku bi şêweyekî bûnewerî bi me ve ne. Jixwe civatên zanistê jî napejirînin ku hevzayendbazî yan jî transseksuelî nexweşî ne, yên ku pêwîst e bîn pakkirin.

- Yeqîn di sêrî de hûn ê nexwazin vê yekê gotûbêj bikin, ku ev fambar e. Wekî malbat, pêwîstiya me carinan bi demê û piçek jî bi sarbûna mijarê çêdibe da ku em bikaribin serederîyê bikin bi rewşên girîft ên peywendîdarî zarokê/a xwe re. Lê dibe ku zarokê/a we, nemaze heke ciwan be, li cem xwe wisa şirove bike wekî ev reftara we revek e yan jî hûn vê rewşê tune dihesibînin. Hûn ji zarokê/a xwe re bibêjin, ez pêwîstiya te ya axaftinê fam dikim, lê pêwîstiya min bi demê heye da ku ez bikaribim vê rewşa nû hêlengînim. Ji wî/ê re bibêjin ku ew bêhna xwe fireh bike, gava ku hûn ji axaftinê re amade bûn, hûn ê vê yekê pê bidin zanîn.

- Heke der barê mijara hevzayendbazî yan jî transseksuelîyê de hûn û hevserê/a we ne xwedanên heman nêrîne bin, fikaran nekin. Bi boneya bîr û bawerîyên cuda nekevin nava gengeşîyan. Mifteya pêqayîlbûnê perwerdehî ye û zehf tişt hene ku hûn her du jî hîn bibin. Li hemberî vê rastîya nû hewil bidin ku hûn rêzê li perisîna hev û din bigirin û ji hev re bibin pal û pişt. Pîr û gelek hevser di dawîyê de li ser mijara pejirandinê li ser xaleke hevbeş digihîjin hev. Çêdibe ku sûdewar bibe di mala we de kereseyên xwendinê hebin. Van daynin cîyekî ku hûn her du jî bikaribin bi hêsanî xwe bigihîninê. Ji we her yek dê bi xwe biryarê bigire bê ka hûn ji pêgava dîtir re amade ne yan na.

3-Hêrs û Tawanbarî

- Normal e ku hûn hest bi hêrsê bikin û berê vê hêrsa xwe bidin zarokê/a xwe, hevalên wî/ê, hevserê/a xwe, malbata xwe yan jî endamên malbatê yên din. Tew dibe ku hûn li xwe jî hêrs bibin. Hêrs derbirrana hesta tirs û tawanbarîyê ye, ya ku dibe hûn ji ber gelek sedeman hest pê bikin.

- * Min di kû de şaşî kir?
- * Çawa min nekarî pê bihisim wekî dibe ku ev biqewime?
- * Wekî din ez ê hê rastî çî bêm?
- * Zarokê/a min, berîya ku ji min re qal bike, çî qas wext bi ber xwe ket?
- * Dê helwesta hinekên din çî be? Divê kes pê nizanibe.
- * Alavên min nînin bi qasî ku ez bi vê yekê re serederîyê bikim.

- Dibe ku hûn li xwe hay bibin ku hûn wexta xwe ya ducanîtiyê yan jî salên pêşîn ên temenê zarokê/a xwe tînin bîra xwe ji bo ku hûn bikaribin hin bersivan peyda bikin. Tê heye ku hemû bersiv nîşan bidin wekî çêdibe ku pêşî li vê yekê bê girtin yan jî bê edilandin, lê we û hevserê/a we, we ti tiştêkî çewt nekir. Ji ber ku rewşeke çewt li holê nîne. Û ev rewş ne rewşek e, ku mirov bikaribe biedilîne. Çi qasî jî takekesên LGBT di civakê de kêmar bin jî (devîdevî % 10), ew her dem hebûn û dê hebin. Ev yek bi temamî xweristî ye û mirov dikare derpêş bike ku yeqîn beşeke civakê ne



heteroseksuel e. Eynî weku pirranîya mirovan destê xwe yê rastê bi kar tînin, hin mirov jî çepo ne...

- Heke dê û bavên azeb bawer bikin ku zarokê/a wan ji gelek alîyan ve hejar e, reng e ku ew ê tûşî hesteke tawanbarîyê ya giran bîn. Divê bê zanîn ku dê û bavên azeb nisbet bi yên zewicî li ser rêjeyeke zêdetir zarokên LGBT xwedî nakin. Di perisana zarokî/ê de girtina rola nimûneyî kar tê dike bê ka dê zarokî/ê reftarên xwe yên çawa hebin, ew ê cîhanê çawa bi nav bike û li gel cîhana dereke peywendîyeke çawa dayne, lêbelê ev yek li ser beralîbûna wî/ê ya zayendî yan jî pênasaya zayendê kartêker nabe. Rasterêtirîn girûvên peywendîdarî vê yekê ji xebatan têne bidestxistin, ên ku li gel malbatên ku tê de dê û bav hevzayendbaz in hatine kirin. Beralîbûna zayendî ya zarokên ku di van malbatan de têne gihandin cudatir nehatiye dîtin ji ya zarokên ku bi dê û bavên heteroseksuel re di heman malbatê de ne.

- Bi bîra xwe bixin; hewce nake ku hûn kesekî tawanbar bikin, wê zarokê/a we di mijara perwerdehî, dahatû û bipêşdeçûna xwe ya pîşeyî de bibe xwedîyê/a jîyana ku bi xwe hilbijêre. Û, wekî dibe ku we ji berê de hizra vê yekê kiribe, lê ev yek ê nebe 'rewşeke darî çav bûyî', bi tenê ew ê cihêreng be.



4-Girtina Biryaran

-3 Rêyên Gengaz-

Piştî ku dilê we ji binê ve li vê nûçeya nû spî bû û li ser yeka ku di mijara kesayetîya zarokê/a we, peywendîya we ya bi wî/ê re û pîlanên bo dahatûyê de dê ti tişt neguhere we bawerîya xwe bi xwe anî, dubare hûn dikarin dest pê bikin di mijara wekî zarokê/a we kî ye/û ew ê bibe kî de hestên xwe û sehekên xwe terîf bikin. Wê asteke nû ya ku bi saya ragihana we ya roj bi roj a li gel zarokê/a we hûn gihiştibinê zêde bibe li hemû tiştên ku hûn heta vê xalê hîn bûbin. Peywendîya dê û bavên û zarokan bi giştî rêyên li jêrê li xwe digire.

a.Piştewanîker: Dema ku dê û bav berê xwe bi hûrgilî bidin şadîya zarokên xwe, gelek mijarên din bi dîmaneyî girîngîya xwe winda dikin. Wateya vê yekê ne ew e ku dê û bav êdî ji LGBTbûnê fam dikin yan jî vê yekê qebûl dikin. Wateya vê yekê ew e ku, çî qas asteng yan jî arîşe derkevin jî, girîngtirîn tişt ew e ku zarok tendurist û bextewar bin. Li ser yeka ku bikaribin hîn bikin ku bi endamên malbatên din re reftarên tendurist peyda bibin, hin malbatan şanseki zêde heye. Di malbatên ciwan de dê û bavên piştewanîker ji bo xwîşk û birayên biçûk dikarin helwest û reftarên tendurist û veguhestina hestan bi awayekî rast saz bikin. Di malbatên pîrtir de dê û bavên bi temenê xwe mezin dikarin ji bo takekesên mayî yên malbatê kartêkeke erênî biafirînin. Wekî encam, berê van malbatan bo hînbûnê vekirî ye û ji xwe re nakin muşkilê ku vekolanê bikin ji bo kesên ku ew jê hez dikin, ên ku parçeyekî malbata wan in. Her wisa dê û bavên piştewanîker piştewanîyê li hev û din jî dikin.

b.Yên ku stû xwar dikin (dev jê berdidin) yan jî piştevanîker bi awayekî pêbend bi mercan ve (bi merc):

Dê û bavên ku LGBTbûna zarokên xwe hildigirin gelek caran xwe wekî pejirandî dibînin, ji ber ku ew bi tenê li ser asta axaftina der barê mercan de dimînin û pê berdewam dibin di mijarên din de piştevanîyê dikin li zarokên xwe. Ev dê û bav bi rêbazên bi darê zorê bertengkirinan disepînin da ku bêzarîya xwe nîşan bidin yan jî helwesteke tinazker werdigirin û rewşên ciyê bêzarîyê diafirînin. Hindek dê û bav serdana zarokên xwe ya bo partnerên xwe qedexe dikin, yan jî henekên genek dikin, ên ku bidî çavên kesên din wî/ê bidin şermê. Çêdibe ku hin dê û bav bibêjin, em ji LGBTbûna zarokên xwe fam dikin, lê bixwazin ku zarokên wan vê yekê nejîn, ku ev jî xweferzkirineke nerasteqîne ye. Li dû van reftaran zarokên gewrelaw û gewrekeç, heta ku ji wan bê, bi dê û bavên xwe re dema xwe kêm dibihurînin, yên balix jî hemû hûrgilîyên der barê jîyana xwe ya xwemalî de vedişêrin da ku tûşî tengkirin yan jî gefan neyên. Zarokên ku li gel dê û bavên ku bi vî awayî tev digerin dijîn, bi tirs ku dê malbatên wan ji wan bixwazin ku ew terka malê bidin, piştevanîya xwe ya darayî bibirrin yan jî piştevanîya xwe ya bo perwerdehîya wan bidin sekinandin, pirrî caran bê gav dibin ku bi derûneke diltepîn bi jîyana xwe berdewam bibin.

c.Yên ku ne piştevanîker in yan jî yên ku Darêzger in:

Dê û bavên ku piştevanîyê li zarokên xwe yên LGBT nakin, ne ku bi tenê peywendîyekê ji dest didin, a ku ji bo şadîya wan bi xwe zehf girîng e, lê diwartir jî dikin ku zarokên wan derbasî jîyaneke kahîl a tendurist bibin. Hin ji van dê û bavan rêzgirtina takekesên malbatê yên din jî ji dest didin, ên ku ji zarokî/ê re piştevan in. Dê û bav xwe ji ragihana

civakî ya li gel hevalên wî/ê yan jî li gel endamên malbatê yên din dûr didin, xwe kerr dikin û xwe di dolabê de (li pişt derîyên radayî) hepis dikin.

5-PEJIRANDIN:

Dê û bavekî ku bi rastî jî pejirandibe, li şûna ku zarokê/a xwe biguherîne, divê civakê biguherîne. Dibe ku em giş nikaribin di qonaxa xwe ya pejirandinê de bi vî çendî bi pêş ve biçin. Pirranîya endamên malbatê wekî piştevanîker dimînin, lê di binî re hevî dikin ku zarokên wan bibin heteroseksuel. Wateya pejirandinê hew bi tenê ne ew e ku ew zarokê/a xwe bipejirîne, her wisa ew e ku êdî xwe wekî dê û bavê takekesekî/e LGBT bipejirîne. Bi îhtimaleke zêde hûn ê li ba hemû kesên ku hûn nas dikin qala vê rewşê nekin (lê hin dê û bav hene, yên ku qal dikin), lê hûn ê nema hest bi pêwîstîya bi veşartinê jî bikin. Bi qonaxa xwe ya pejirandinê re hûn ê hest pê nekin ku beralîbûna zayendî ya zarokê/a we yan jî pênasawî/ê ya zayendê barekî giran e, hûn ê pê bihisin ku ev xelatek e û parçeyekî yekparetîyekê ye, ya ku wan dike kesên taybet...

MÎT Û STEREOTÎP

Her çend mirovahîyê gotûbêjên li ser babetên girîng kuta kiribin û ew danûbin alîyekî jî, hê jî di hin babetan de mîtoloji dikare dirûvê rastîyê bigire. Ji ber ku li ba civakên bergirtî yên wek ên me kêma behsa têgehên peywendîdarî zayendîtîyê tê kirin, merc bendkirî ne ku mirov di vê babetê de zanyarîyan bi dest bixin. Lêbelê dilê mirovan pê ve ye ku ji tiştên ku nas nakin û her wisa jî jê fam nakin bitirsin; nemaze jî ku mijara vê behsê mirovên din bin. Şaşîyên têgehî yên ku bi kûrtirîn şeweyî mirov pê bawer dikin û guherandina wan ji her tiştî zehmettir e, mixabin ew in, ên ku pirrtirîn zîyanê didin. Îro, gelek mirov dikarin li ser cîyawazîyên zayendî gotûbêjên durist bikin. Qewî zêde mîten kevin bawerîpêkerîya xwe winda dikin, lêbelê hûn dikarin hindekên hê jî heyî li jêrê bibînin.

- 1- Ez çu kesekî/ê nas nakim, ê/a ku xwe wekî gey, lezbîyen, bîseksuel yan jî transseksuel terîf dike.
 - Dibe ku hûn kesekî/ê nas nakin, ê/a ku di civata xwe de pênasîya xwe ya LGBT bi awayekî eşkere dijî, lê teqez hûn yekî/ê nas dikin, ê/a ku beralîbûna xwe ya zayendî ji kesên dîtir vedîşêre, bes hê hûn pê nehisiyane.
- 2- Ku hûn li reftaran binihêrin, hûn dikarin fam bikin wekî mirovek gey, lezbîyen, bîseksuel yan jî trans e.
 - Çêdibe ku reftarên kesekî/ê yên di nava civakê de, cil û bergên wî/ê, şeweyê axaftina wî/ê, awayê ku ew bi kesên din re têkilîyê datîne ji alîyê kesine din ve wekî “jinwarî” yan jî “mêrwarî” bê hêlsengandin. Ev taybetî ne peywendîdarî beralîbûna zayendî ne, lê peywendîdarî rolên zayenda civakî ne. Yek ji berbelavtirîn şaşbawerîyên peywendîdarî hevzayendbazîyê ew e ku gey

‘jinwarî’ ne, lezbîyen jî ‘mêrwarî’ ne. Bê guman ev yek ji bo beşeke hevzayendbazan rast e. Takekesên xwedîyên reftara û rûçikê ku tê hizirkirin xweserî zayenda dij e, ji bo ku ji ber normên zayenda civakî yên qalibgirtî mirov bêtir çav bi wan dikevin, mirov bêtir bi geyên jinwarî û lezbîyenên mêrwarî dihisin. Lêbelê dema ku ew bêtir xuya bin, wateya vê yekê ne ew e ku hemû hevzayendbazên mêr jinwarî ne yan jî her mêrekî xwedîyê taybetîyên ku ji hêla kesine din ve wekî jinwarî têne dîtin hevzayendbaz e. Heman rewş ji bo jinan jî wisa ye.

3- Mêrên gey dixwazin bibin jin, lezbîyen dixwazin bibin mêr.

- Hin mirov di bedena mêrbûnê de ji dayîk bûne, lê xwe wekî mê terîf dikin, hindêk jî di bedena jinbûnê de ji dayîk bûne û xwe wekî mêr terîf dikin. Ev rewş peywendîdarî pênasa zayendê ye, wate, peywendîdarî têgihîştinê ye, bi kîjanê ew takekes bedena xwe û xwebûna xwe di zayendê de dibîne, lê ev ne peywendîdarî beralîbûna zayendî ye. Takekesên hevzayendbaz ji ber bedena xwe ne aciz in, ew bextewar in, wan daxwaz nîne ku wek takekesên transseksuel ên tûşî bêahengîya pênasa zayendê bûyî hormonan bixwin yan jî bikevine ber operasyona neştergerî ji bo ku rûçikê xwe yê anatomîk biguherînin.

4- Di têkilîyeke hevzayendbaz de kesek di dilqê mêr de ye, yê/a din di dilqê mê de ye.

- Beralîbûna zayendî peywendîya xwe li gel rol û reftarên zayendî yên kesî/ê nîne, wate, ne peywendîdar e li gel yeka bê ka ew çî qasî mêrwarî yan jî jinwarî tev digere. Mirovên gey, lezbîyen û bîseksuel, ji ber heman sedemên bi cotên heteroseksuel re heyî, dikevin têkilîyê: hezkirin, kêşa zayendî, hevaltî, armanc û îdealên hevbeş. Çêdibe ku du mêrên maskulen (yan jî femînen) bo hev bibin partnerên jîyanê yên nimûneyî, eynî çawa ku çêdibe ku du jinên femînen (yan jî maskulen) wisa bibin.

5- Geybûn, lezbîyenbûn yan jî bîseksuelbûn şaş e, nexweşî ye.

- Ev devîdevî çil salan e ku pîsporên tenduristîya derûnê hevzayendbazîyê wekî xerabebûnekê napejirînin. Pejirandina zanistî ya gelemperî ew e ku di çarçoveya fireh a zayendîtîya mirovî de hevzayendbazî, bîseksuelî û heteroseksuelî ji awirê erkên takekesî û civakî ve beralîbûnên zayendî yên ji hev ne cuda ne, ku di ser hev re nîn in, yek ji yeke din kêmtenduristtir yan jî kêmasayîtir nayê pejirandin, yek ji yekê kêmtir yan jî zêdetir derfetê dabîn nake bo têrbûna derûnî û bedenî. Ji ber ku hevzayendbazî xerabebûnek nîn e, çênabe ku mirov behsa pakkirina wê jî bike. Heke em bi şêweyekî dîtir derbibirrin, çawa ku dermanekî, terapîyeke, peyaneke neştergerî tune, ku bikaribe heteroseksuelekî/ê bike hevzayendbaz, awayê wê yê berevajî jî ne pêkan e. Homoseksuelî ne kêşeyek e, tiştê kêşe ew e ku bête hizirkirin pêwîst e em hemû heteroseksuel bin.

6- Guneh e ku mirov bi zayendî peywendîyê bi hevzayendê/a xwe bike.

- Digel ku li gorî gelek bawerîyên cîhanê pîrr û gelek bîr û boçûnên peywendîdarî hevzayendbazî û transseksuelîyê hene, gelek ji van hevbîr in li ser mijara ku nevîn û xwelêranegirtin şaş e. Di hemû pirtûkên pîroz de pend û şîret li bûnewerê bi navê mirov tê kirin ku ew li hev berbor û nefsbîçûk bin. Qal tê kirin ku yê/yadinkirin û darizandin çewt e. Hemû ol hezkirin û xweşbînîyê pîroz dizanin. Îro roj, gelek ol endamên xwe yên gey, lezbîyen, bîseksuel, trans û navzayendî bi xweşbînî di civakên xwe yên bawerîyê de dihebînin.

7- Hevzayendbazî yan jî transseksuelî li dû kêşeyên berwext ên perisana mêjî yan jî hin şêweyên gihandinê yên piştî zarokanîyê peyda dibe.

- Ti kes nikare bi vebirî bizanibe bê ka çima hin mirov LGBT ne û yên din ne wisa ne. Gelek lêkolîner pê bawer in çênabe ku ev yek

ji pêkerekê bizê; ev yek encameke kombînasyona pêkerên civakî, derûnî û bîyolojîk e.

Digel ku bawerîyên şaş ên di mijara şêweyê gihandinê de di salên 1950'yî wan çaxan de di civatên psîkanalîzê de hatine pejirandin, gelek xebatên ku di serdema me de hatine kirin selmandine ku beralîbûna zayendî û pênasî zayendê ne girêdayî şêweyê gihandinê ya dê û bavên in. Çawa ku çênabe li cîhanê takeqerekerê hevzayendbaz yan jî takeqerekerê transseksuel hebe, wisa jî malbata LGBT ya yekcureyî jî tune. Ev bawerîya ku bi civakî tê ferzkirin ku rast e, ji bo ku hebûna takekesên kêmar ên zayendê yê ku bi kêmasî û nexweş dihesibîne rave bike, dê û bavên tawanbar dide zanîn û bi hinceta ku “dê û bavên kêmar in” wan jî ceza dike, heramoyî dike û dike ku ew xwe veşêrin yan jî weku di dîyardeya “Ahmet Yıldız” de qewimî, dike ku ew zarokên xwe bikujin.

8- Hevzayendbûn yan jî transseksuelbûn hilbijartinek e, ku mirov bi dilê xwe dike, heke bi têra xwe bê xwestin, çêdibe ku bê guherandin.

- Kesî li ser mijara bê ka ew ê bi şêweyê zayendî û hestî peywendîyê bi kîjan zayendê bike biryar

negirtîye. Çawa ku ti heteroseksuelek di balixbûna xwe de biryarê nagire ku hez ji zayenda dij bike û berê jîyana xwe bi vî awayî durist nake, takekesên LGBT jî tercîheke bi vî rengî nekirine. Ji ber ku ne hilbijartinek e, ya ku bi dil hatibe kirin, gava ku bê xwestin, ne pêkan e bê guherandin. Warê ku kes bikaribe biryarê li ser bigire beralîbûna wî/ê ya zayendî yan jî pênasî wî/ê ya zayendê nîn e, lê ew yek e bê ka bi rê û rêzana vê taybetîya ku wî/ê bi bûnewerî anîye dixwaze pêkvebûnên çawa bijî û ew ê di nava civakê de çi qasî û çawa xwe derbibirre. Vebijarkên peywendîdarî van hilbijartinan, bi qasî ji bo heteroseksuelan, ji bo takekesên LGBT jî, bi hejmara xwe gelek in û xweserî takekesî/ê ne.

9- Çima takekesên LGBT bê gav in ku zayendîtîya xwe nîşan bidin?

- Ev pirs bi xwe re pirsî ‘Nîşandan çi ye?’ tîne. Mirovên heteroseksuel pirrî çar wêneyekî partnerê/a xwe datînin cîyê ku ew tê de dixebitin, gava ku bi dilrihetî dibêjin, merheba yan jî bi xatirê te, hev radimûsin, dema ku derdikevin û dimeşin, bi destê hev digirin û gustîlên nîşaneyî bihevrebûna xwe dixine tîlîyên xwe. Gelo ev nîşandan e?
- Di civakên bo mafên mirovan hestiyar û azadîxwaz de, ku hûn heteroseksuel yan jî LGBT jî bin, ji mafê her kesî ku di nava civakê de bi awayekî rêzgir hezkirina xwe nîşan bide. Ti kes ji vî mafî cudagirtî nîn e û ti kes jî vê yekê kêmtir heq nake ji bo ku bi statûya xwe ve kêmar e.
- Heyf û xebînet, zayendên bi hejmara xwe ve kêma bi gelemperî tûşî zehmetîyan tên ku hezkirina xwe bi dilekî rihet nîşan bidin. Mînak, heke jinek di markêta de cizdanê xwe bixe erdê, gava ku partnera wê ya hevzayend cizdên ji erdê bigire û bide wê, bibişire û li şûna ‘mala te ava’, bibêje, ‘mala te ava, hezkirîya min’, gelo dê çi biqewime?.. Gelek mirov dizivirin û

bi awayekî ku aciz bikin ziq li wan dinihêrin. Tew dibe ku hin ji wan li pey wan bikin kurtepest yan jî bi rê de wan zivêr bikin heta ku ew biçin ber seyareya xwe. Îcar, gava ku em hizra vê nimûneya jinê bikin, gelo hûn dikarin bibêjin ku jinik tûşî reftarên cudaker tê ji bo ku zayendîtîya xwe nîşan dide?..

10- Hevzayendbaz bi awayekî çawalêhato têkilîyên zayendî datînin, ew nikarin bihevrebûnên demdirêj û cîyê têrbûnê çêkin.

- Hevzayendbaz jî, mîna heteroseksuelan, dibe ku bihevrebûnan bijîn, ku tê de bi tenê hevpişkîya zayendî hebe yan jî nêzîkbûna zayendî û hestiyar pêk ve be, ev bihevrebûn demkurt yan jî demdirêj bin, hevser li gel hev dilsoz bimînin yan jî nemînin. Çawa ku çênabe têkilîyên zayendî û hestiyar ên her takekesekî/e heteroseksuel yekcureyî bin, wisa jî têkilîyên takekesên hevzayendbaz jî li ser asta takekesî ciyawazîyên xwe hene. Ku mirov hez bike û bê hezkirin, dest bi têkilîyekê bike û bikaribe pê berdewam bibe, ev yek ne peywendîdarî beralîbûna zayendî ye. Dema ku li jêr şert û mercên ku wek heteroseksuelan ew jî xwedîyên maf û azadîyên xwe bin, dê hingê pêkan bibe ku takekesên hevzayendbaz ji der û dora xwe re bervekirî bin û di nava kêşa jîyana rojane re ji xwe re hevserên guncan peyda bikin. Li welatên ku hevzayendbazî di nava civakê de bêtir bi azadî diqewime encama xweristî ya yeka ku ew dikarin peywendîyên demdirêj bijîn ew e ku hevzayendbaz bo mafên her wekî zewacê, mîratê û xwedîkirina zarokan têkoşanê dikin.

11- Ku gelek caran dubare tê gotin ku hevzayendbazî ne nexweşî ye û divê asayî bê zanîn, hevzayendbaz beralîbûna xwe ya zayendî eşkere derdibirrin, di çapemenîyê de cî digirin, ev yek ciwanan hanî hevzayendbazîyê dide.

Hê jî pergala me ya perwerdehiyê xwe li beralîbûnên zayendî yên li derî heteroseksueliyê nake xweyî û tune dihesibîne. Heta demeke nêzik jî di jêderkên çandî de, yên berbelav, ên ku mirov dikarin bi hêsanî xwe bigihîninê, hevzayendbazî, kêmxistin, qerf arasteyî takekesên ku li gel normên gelemperî bûyî yên civakê wekî navgîna çewisandinê cî digirt. Tê zanîn ku li ba civakên ku ev helwest tê de zal e hevzayendbazî ji holê ranabe, her wekî di nimûneya Îranê de, dema ku zordanên tundtir tîn sepandin jî, dikare bi hebûna xwe berdewam bibe. Weku li Ewrûpa û li Bakurê Emerîkayê, dema ku nêzîktêdayîneke ku hevzayendbazîyê dike nerênî tê hebandin jî, tê hizirkirin ku ev yek berbelavbûna hevzayendbazîyê ya di civakê de zêde nake. Civaka heteroseksîst a ku ferz dike wekî divê hemû kes heteroseksuel bin, qonaxên vebûnê yên takekesên hevzayendbaz tepeser dike û rê li ber wan digire ku ew bi awayekî eşkere xwe bikin heyî. Lewma jî, tiştê ku zêde yan jî kêm dibe ne ku hevzayendbazî ye, lê xuyanîtiya hevzayendbazan e.

- Diltirsîya ji xuyanîtiya hevzayendbazîyê peywendîdarî wê mîtê ye, ya ku dibêje, ku wekî nimûne bê girtin, hevzayendbazî dikare berbelav bibe. Ku zarok di henga perisana xwe de rola nimûneyî bigire, ev yek li ser reftarên zarokî/ê, binavkirina wî ya cîhanê û bê ka ew ê li gel cîhana dereke peywendîyeke çawa çêke kartêker dibe, lêbelê li ser beralîbûna zayendî kartêker nabe. Rasterêtirîn delîlên peywendîdarî vê yekê ji xebatan têne bidestxistin, ên ku li gel malbatên ku gey û lezbîyen tê de dê û bav in têne kirin. Beralîbûnên zayendî yên zarokên ku di nava van malbatan de mezin dibin cihêreng nehatine peyda kirin ji yên ku bi dê û bavên heteroseksuel re mezin dibin.

12- Takekesên bîseksuel nizanin bê ka çi dixwazin. Ew dikarin bi her kesî re bibin partner, ên ku dilxwaz in bi wan re seksê bikin.

- Vê yekê peywendîyeke xwe nîne li gel yeka ku mirovek bi beralîbûna xwe ya zayendî ve yekjinî/mêrî be yan jî bê ka têkilîya zayendî pirr dixwaze yan jî hindik. Gelek mirov pê bawer dikin ku beralîbûna zayendî û pênasa zayendî ji hevberan (gey/heteroseksuel, maskulen/femînen, mêr/jin) peyda dibe, lê ev ne rast e.

Ji ber ku takekesê/a bîseksuel li şûna yek ji komên dij bersiva ‘her duyan jî’ dide pirsra ku dipirse çi ka ew kê rakêşer dibîne, der barê bîseksueliyê de di hişên mirovan de birrek pêşdarazî pêk tîn. Di bingeha vê rewşê de ew bawerîya şaş heye, ya ku dibêje, dilê takekesên bîseksuel di heman katê de hem jinan hem jî mêran dixwaze. Reng e ku dilê takekesên bîseksuel di serdemên ‘cîyawaz’ ên jîyana wan de bi awayekî zayendî û romantîk her du zayendan jî bixwaze yan jî di dûmahîya jîyana xwe de ew kes têkilîyê bi tenê bi zayendekê re daynin û bi zayenda din re ti tiştêkî din neceribînin.

13- Mêrên gey û bîseksuel bêtir mêldar in ku ji aliyê zayendî ve zarokan îstismar bikin.

- Ciyê mixabinîyê ye ku di civakê de, ya ku em tê de dijîn, komên ku pirranîyê nadin der, navê raşehitîyê bi ser wan dixin û dikin ‘yên din’. Takekesên hevzayendbaz û trans, eynî wek takekesên din ên ku pirranîyê pêk tînin, dikarin bi awayekî tendurist, li gel hezkirinê û bi rêzgirî bi hev re bin. Ji ber vê yekê, ne zanistî ye ku komek wekî raşehitî û averêbûyî bête wêsfandin ji bo ku ne di nava pirranîyê de ye, di rastîya xwe de ev bi awayekî polîtîk bilêvkirineke cudaker e.

- Parafilîyên (averêbûnên zayendî) ku têgeha pedofilîyê (îstismarkerîya arasteyî zarokan) jî tê de cî digire, bi gelemperî, wekî tiştê yan jî armanca niçên zayendî, hebûna reftar û fentezîya averêbûyî yan jî bi darê zorê nîşan dide. Ji bo bi bijîşkî nasana parafilîyê, kartêka nerênî ya li ‘zerengîya çalakîya

zayendî ya beramber, dilovan a ku hezkirinê bi xwe ve digire' divê wekî pêwîstîbûnekê bête danîn. Çawa ku tê zanîn, têkilîyên hevzayendbaz eynî wek têkilîyên heteroseksuel van kartêkên nerênî hîlnagirin.

- Heyzayendbaz, eynî wek takekesên heteroseksuel, ne li pey in ku kîjan mirov bikeve ber wan, bi wan re bi zayendî bi hev re bin. Takekesên ku mêla wan li ser e ku zarokan bi awayekî zayendî îstismar bikin reng e ku ji her beralîbûna zayendî bin. Zanyariyeke wisa tune, ya ku bibêje wekî pirranîya van kesan hevzayendbaz in.

14- AIDS nexweşîyeke kesên gey e.

- A rast, jinên heteroseksuel serjimara HIV'a pozîtîv a ku ji gişan bêtir bi lez zêde dibe pêk tînin. Bi bawerîya ku ji bo HIV'ê metirsîya zêde bi wan re heye, gelek Navendên Xwînê ji takekesên LGBT bexşa xwînê napejirînin. Lêbelê, berevajî vê yekê, dema ku jinên heteroseksuel dixwazin xwînê bidin, tûşî ti cudakerîyê nayên.

- Di bûyerên pêşîn de, di kîjanan de enfeksîyona HIV'ê hatîye selmandin, kesên hevzayendbaz bûne, vê yekê jî di sêrî de kirîye ku hin derdor hizir bikin wekî AIDS nexweşîyeke xweserî hevzayendbazîyê ye. Lêbelê, AIDS'a ku sendromeke têkçûna erka bergirîyê ya girîng e, ya ku girê dayî enfeksîyona HIV'ê ye û dikare di heyamên paşwextiyê de ji ber vê enfeksîyonê rû bide, dest pê bûye bi her mirovên ji her beralîbûna zayendî, ji her pênasaya zayendî, ji her zayendê, temenî û regezî re hatîye dîtin. Bi vî awayî eşkere destnîşan bûye ku van nexweşîyan peywendîya xwe li gel taybetîyên pênasê nîne û hatîye hîn bûn ku jêgirtin bi rêya xwînê û berhemên xwînê, têkilîya zayendî û veguhêzîya ji dayîkê bo zarokî/ê çêdibe. Reng e ku her kes bi rêyên curecurê ve enfeksîyonê vegire û amajeyên klînîk ên bi wê re peyda bûyî jî li gorî beralîbûna zayendî cîyawazîyan nîşan nadin.

- Rêbazên ku têne pêşniyarkirin wekî mirov xwe biparêze ji nexweşiyên ku di henga têkilîya zayendî de bi rêya zayendî têne vegirtin ji bo kesên hevzayendbaz, bîseksuel û heteroseksuel cihêreng nîn in. Tiştê ku metirsîya jêgirtinê destnîşan dike ne ew e bê ka hûn kî ne, lê ew e bê ka hûn çawa tev digerin. Bi her takekesî/ê re, yê/a ku sepanên seksa ewle pêk neyne, dê metirsî zêde bibe. Ji ber vê yekê jî, di têkoşana li gel enfeksiyonê de ne ku komên metirsîyê, lê reftarên metirsîdar têne dupatkirin. Îdiaya ku dibêje wekî hevzayendbaz koma metirsîdar in dibe sedema ku heteroseksuel bi awayekî ne rasteqîne bi kîsê xwe ewle bin û xwe neparêzin. Daneyên peywendîdarî berbelavîya enfeksiyonê demeke dirêj e nîşan didin ku di nava salan re leza zêdebûna berbelavîyê bi heteroseksuelan re bilindtir e ji ya bi hevzayendbazan re.

- Yek ji sedemên ku gey bêtir metirsîdar tînin ferzkirin jî têkilîya anal e. Çêdibe ku têkilîya anal ji têkilîya vajînal û ew jî ji seksa oral metirsîdartir be. Lêbelê ev birêzkirin ji bo têkilîyên bêparastin ên ku tê de prezervatîv nayê bikaranîn rast e. Jê girîngtir jî ew e ku têkilîya anal ne ew têkilîyek e, ku bi tenê hevzayendbaz tercîh dikin, û hemû hevzayendbaz nakevin têkilîya anal.



Benim Çocuğum

bir aile filmi

SURELA FİLM SUNAR "BENİM ÇOCUĞUM" ÜZÜN HİSTERAKI BELGESİLLERİNİN YÖNETMENİ CAN CANDAN
ÖMER CEYLAN ŞULE CEYLAN GÖNSELİ DUM PINAR ÖZER SEMA YAKAR NİLGÜL YALÇINDIĞLI ZEKİ YALÇINDIĞLI
SARAYTU YÖNETMENİ ÖĞÜZ YENEN YETİ ÖĞÜNÇ HATİPOĞLU KURSU GÖKÇE İNCE YARIMCI YÖNETMENİ BOYSAN YAKAR
DİTAR YAPIMCI H. METEHAN ÖZKAN YAPIMCI/AR CAN CANDAN, AYŞE ÇETİNBİŞ, GÖKÇE İNCE MAYIS AYI 2013

SURELA
FİLM



www.benimcocugumbelgesieli.com

28

Em çawa hevdu nas bikin?

Birayê we yan nasekî we ku LGBTÎ(Lezbîyen,Gey,Bîseksûe l,Trans,Intersex)'ye u daxwazîya we jiboy piştvanîyê heye hûn dikarin bigihîjin me.

Jiboy ku em pirsgirên xwe pê derxin u em bikarin ezmûnên xwe bidin hev, em dixwazin we nas bikin.

Xet a şêwirdarî: 0531 467 77 53

Navnîşan a me înternetê: www.listag.org

contactlistag@gmail.com



KOMA STENBOLÉ YA MALBATÊN LGBT'YAN



LISTAG

**Civaka Malbatên
LGBTI'yan**

0531 467 77 53